## Tirkiye û Azerbaycan korîdora Laçînê jî ji Ermenistanê dixwazin!

»»» R:7



## Yelda û Çwarşeme Sûrî, rojên xebat bi dijî kevnarperweriyê

»»» R:2

## Wekheviya zayendî rêya azadiya civakê ye

»»» R:3

## Jinên azadîxwaz dîwarên tirsê şikandin

»»» R:9

*Bidestveanîna mafên neteweî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (458) 22-11-2023 Buha (1000) Tûmen

# Xezelwera yadê werîna dehan xezanan

Kes yan kesanek dema ku li rêka berjewendiya giştî de, wek azadî, mafê gele û civatgehekê de cane xwe ji dest didin, ev dibne cangoriyê wê civatgehê ku di nava gelê Kurd de û li dirêjiya doza berheqe netewa Kurd de ev kesan bi şehîd hatine navdêrkirin.

Di Îrana jêr deshilata rejîma dîktatore Axundî de jî, heçî kesekî xebatkar û azadîxwaz ku li ser daxwaza mafê giştî wek azadî dikeve ber girtin û kuştin û îşkenca rejîmê, bê guman ev li ser mafê giştî rastî girtin û kuştinê dibe û ti arîşeyekî takiye xwe çinine, Şehîd û cangoriyê rêka xebat ji boy bidestveanîna mafê giştî de tête hisab.

Bi dirêjiya 45 sal deshilata dîktatore wê rejîmê de renge gelek kesan û li qonax û bi awayên cuda cuda de, cane xwe ji dest dabin û hatibne şehîdkirin, bi taybetî Rojhilatê Kurdistanê ku heya îro rojê berxwe dide û nekevtiye qedeman û dengê şoreş û berxwedanê li vir heye, hemî bi xwîn û fîdakarî û canliserdestiya Şehîdên xwe bûye.

Herçiqas hemî şehîdên Kurdistanê, ku ji aliyê rejîma dîktaror ve li qonaxên cuda de cane xwe goriyê bi destvehatin maf û azadiya netewî kirine, cihê pêzanînê ne û ti caran nayêne ji bîrkirin, û gelê Kurd wan bi serwerê dîroka rizgarîxwaziya xwe dizane û wan ji bîr nake, lê renge li nava Îranê û netewên dine de bi wî cureyî nebe. Bo mînak ger em behsa şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" li sala derbasbûyî de bikin, em bi başî she bi wê cudahiyê dikin.

Niha ku salek bi ser wê şoreşê de derbas dibe, kêm roj heye ku roja salvegera şehîdbûna çendîn xortên şoreşvan nebe, bi taybetî li vê meha Xezelwerê de rejîma dictator û cinayetkar ji bona parastina deshilata xwe, herî zêde xwenîşander li Kurdistan û Îranê de şehîd kirin. Gorî amarn nêzî 600 kesî ji Kur û Keşên xwenîşander şehîd bûn ku nêzî 140 kesî ji Kurdistanê bûn.

Gelê Kurd gorî kultur û adetê xwe ku me bas kir ku şehîdên xwe ji bîr nake, berdewam li ber kêlega malbat û kes û karên wan şehîdan bûne û bi merasiman û kombûnan yadê şehîdên xwe bilind ragirtine û dane selimandin ku ev şehîd, tenê kur yan keça malbata xwe nine, belku her çavan li pêxema azadiya netewa xwe de cane xwe gorî kiriye, her wisa jî şehîdê netewa xwe ye.

Niha kêm roj heye ku yekemîn salvegera şehîdbûna şehîdek yan çend şehîdan li kurdistanê de nebe, hemî rojê zêdebarî gef û givaşên rejîmê jî, em dibînin ku gelê me li bajarên Kurdistanê li salvegera şehîdan de yan sardana malbatên wan dikin, yan li ser tirba wan şehîdan kom dibin û bi danana deste gulan û bi rê ve birina merasiman yadê wan bilind radigrin û peymanê ligel xwîna wan nû dikin.

Ev yêke dibe sedemê zindî ragirtina yadê şehîdan û xortkirina hesta wefadariyê û zindî ragirtina hesta şoreşvanî li hizra xortan û civatgeha Kurdistanê de û herwisa peyamekî girînge jî bo dujminê dagîrker ku ger tu çiqas ji me şehîd bikî, hinde dine zêdetir me mukur dikî li ser domandina rêbaza rizgarîxwaziyê û gelê Kurd bi dana nirxa girane weke riha xortên xwe ji nav naçe û teslîm û çavtirsandî nabe.

Belê renge ev culture di nawçên dine ye Îranê de û li nava netewên dine de wek Kurdistanê nebe, bê guman ev cudahiye jî vedigere bo ser xebata dûr û dirêje netewa Kurd, li ser hesta yekîtî û yekdengiya gelê Kurd, li ser bê mafî û zilma çend qate dujmin li dijî gelê Kurd, bi taybetî vedigere bo ser bi rêkxistinî kirin û hişyarî û hişmendiya civatgeha Kurdistanê bi sedema hebûna partên siyasî û şoreşvan û pêşenge xebatê bo mînak hebûna hizbekî wek Hizba Demokrat a Kurdista Îranê ku pitir ji 7 dehkane ji xebat û berxwedanê nesekiniye û bi vê xebata xwe kariye cihpêyekî mezin li Kurdistanê hebe.



Cuda ji hev xemî û beşdariya gel mil bi milê malbatên şehîdan, em dibînin ku Hizba Demokrat pêşeng bûye bo evê ku yadê wan şedîdan ku li şoreşa sala derbasbûyî de cane xwe ji dest danî hertim zindî rabigre, lewma bi awayekî dervest ragihandina xwe de bi taybetî li Kurd kanalê de, pare û demekî zêde terxan kiriye bo zindî ragirtina wan şehîdan.

Xwîna wan şehîdan û hemî şehîdên doza berheqe gelê Kurd bêçine neçoye, belkî li pêxema azadiya miletê Kurd de bûye, lewma hemî gel bi xwîna wan emegdare û wan ji bîr nake û dê berdewam be heya bidestve hatina wan armancan ku Şehîdan li pêxemê de cane xwe gorî kirine.

# Yelda û Çwarşeme Sûrî, rojên xebat bi dijî kevnarperweriyê



**N: Nûredîn Sofîzade**



Şêwreya Çanda giştî a rejîma wilayeta Feqîh navên "Şeva Yelda" Şeva Çille û "Çwarşeme Sûriyê" Kule Çwarşemiyê li rojmêra Îranê de reşkirin û bi diyarîkirina çend risteyan nave nû ji boy wan 2 boneyên dîrokî û çandî re diyarî kirin, niha şûnde dê nave Şeva Yelda yê dê bibe "Roja berfirehkirina çanda mêvanî û têkiliya digel xizm û lêziman, û nave Çwarşeme Sûriyê jî dê li rojmêra Îranê de bê guherîn bi roja rêzgirtin ji Cînaran.

Ev 2 boneyên dîrokî û çandî belkî sedan sale di nava netewên akinciye Îranê û heta welatên herêmê de jî bi navên xwe û kultûra taybet bi xwe hatine naskirin û li ser dev û ziman û hizra xelkê de cih girtine, cehda rejîma dictator ji boyî lêdan û jinavbirina wan boneyên dîrokî û çandî, kiryareke ji boy asmîlasyon yan helandina çand û kultûra gêlên Îranê û dûrxistina xelkê ji wan boneyan û sepandina îdolojîk û hejmoniya kevnarperweraneye xwe.

Gerçî Şêwreya Çandiye rejîmê piştî bertek û dijkiryarên xelkê û xebatkarên navxwe û derveyî welat, bi belavkirina daxûyaniyekê ragihand ku nave wan 2 boneyan nehatine guherîn, belkî boneyên din di wan rojan de hatine diyarîkirin, lê hemî xelk baş haya wan ji pîlan û nexşê qirêj û armanca wê a veşartî heye.

Netewên Îranê gelek baş dizanin ku rejîm dixwaze ne tenê nave wan boneyan, belkî xudî wan boneyan jî ji hole rake, çimku rejî dijî heçî çand û kultura dîroka netewên Îranê ye û deshilatdarên wê rejîmê û bitaybet rêberê dîktatore rejîmê dijayetiya xwe li gel heçî boneyekî dîrokî neveşartine.

Gelek mêjveye ku rêberên rejîmê gotine ku şadî û xweşî û devra hev kombûna xelkê hermae û digel îdolojiya wê rejîmê yêk nagirin.

Elî Xamineyî yê Dîktator û axund û deshilatdarên dine ye rejîmê ji Agir û Govend û şahiya xelkê ditirsin, lewra berdewam gotine ku Agir hermae û ligel mercên îdolojia wan hev nagire, gelek caran ji bona rewayetî dana bi wan gotinên xwe hevara xwe bo Ol û Mesheb û Îslamê birine û gotine Agir dijî Îslamê ye û çanda Agirperestane.

Ji aliyekî dine jî rejîm hertim ji kombûna xelkê û heta ji kombûna xizm û lêzim û çend malbatan bi armanca derbaskirina demekî xweş û şad jî ditirse, wê rejîmê ev 45 sale ku berewam cehd kiriye pêşya şadî û xweşî û dengê sitran û muzîkê û govend û dîlanê û hemî xweşiyên xelkê bigre û çanda şîn û tazî û reşik û girînê û xwe danê û xudûkiyê û xembariyê bi ser xelkê welat de bisepîne.

Rejîm niha bi vê hindê jî nesekiniye û cehda ji hole rakirina boneyên dîrokî û kulturiye xelkê de ye, lê bi wan bertekên ku li wê derheqê de heta niha hatine dîtin, xûya dibe ku netewên Îranê ji bona xwedî derkevtin û parastina çanda dîrokiye bab û kalên xwe dê li hember wan pîlan û armancên qirêje rejîmê de bisekinin.
Bê guman rejîm hindî ku ji wan boneyan û nave wan ditirsiya, niha bi cehda guherîna nave Şeva Çile û Çwarşeme Sûriyê, dest bi bizvandina hesta xelkê biriye û dê bertekên xelkê û dijberiya wan li şeva Yelda û Çwarşeme Sûriya îsal de bikne şoreş û berxwedan û zêdebarî pêşwazîkirin ji wan boneyan weke adetê dîrokî, dê ji boy dijayetiya rejîmê û cehdên rejîmê, çend qat zêdetir û bi gortir, wan boneyan bikne hêcet û çavê rejîmê û rêberên wê pê kor bikin.
Rejîma dictator û kevnarperwere Îranê hebxwe ji heçî kesê baştir dizane ku ev cehdên wê betalin û naçne serî, çikû wê rejîmê ev yêke bi salane ceribandiye û baş dizane ku serkevtin bidest ve neaniye. Rejîmê çend salekan beriya niha nave roja "Sêzdebiderê" guherî kire roja "Tebîet" anku Sirûşt, lê heya îro rojê jî ti kesî ji xelkê Îranê ev nave diyarîkirî yê rejîmê di cihê roja Sêzdebiderê de bikar neanîne. Ku wisaye xelk ne tenê nave diyarîkirî ji aliyê rejîmê ve bo Çarşeme Sûriyê û Şev çile bi kar naînin, belkî xelkê azadîxwaz û netewên Îranê kerbê rejîmê re dê wan boneyan, ji boneyên dîrokî û kultûrî ve bikne rojên xebat bi dijî wê rejîmê.

Rejîmê li rastî de ev 2 bonane jî weke zef bonên dine bo mînak cejna Newrozê bo xelkê re kirne rojên xebat û berxwedan û dijayetiya digel xudî rejîmê. Ez baverim tu opozîsyon û dijber û xebatkarekê renge bi wî awayî hesta xelkê bi dijî rejîmê bibizivîne ku niha rejîmê ev hêceta dayî dest xelkê, li rastî de weke bangewaz û daxwaz kirin ji xelkê be ji bona hindî zêdetir bi germ û gurî vex elk ber bi pêşwaziya wan boneyan ve biçe û pîroz bike.

Ev gotine bila bête tomarkirin ku emê îsal bibînin ku heçî kîjan ji navên Şeva Yeldayê û Çwarşeme Sûriyî dê weke dirûşmên ser zar û zimanê bi milyonan Keç û Kurên şoreşvan bi dijî rejîmê dê bête bikaranîn û kombûnên hindî zêdetir şade xelkê li Yelda yê de, û Agirê peşqel û şadî û govenda Çwarşeme Sûriyê kela dîktatoriya Xamineyî bêxe lerzînê.

Rejîma Komara Îslamî, dujminê sondxwariye xelk û netewên Îranê ye û dijî çand û kultûra hemî netewan e, û ev cehda rejîmê jî tenê bo selimandina vê rastiyê ye û vedigere bo sepandina kultûra paremayîyane û nezaniya wê, ma karîn Newrozê qedexe bikin, ma karîn govend û muzîkê qedexe bikin?
Ma karî adet û tîtalên xelkê ji nav bibe?
Ma wan 45 salan de bi hemî cehda xwe ve, karî îdolojiya paremayî a xwe bi ser xelkê de biqebûlîne?

Ku wisaye ev pîlan û armanca rejîma dijî gelî jî tiştekî betal û bê bandore û eva ku ez pêşbînî dikim dê bibe kevirekî req li nav serê rejîmê bigre.

# Wekheviya zayendî rêya azadiya civakê ye



**N: Dr.Mecîd Heqî**

Di van salên dawî de, 3 pêvajo li ser hebûn û rola Jinê di civakê de bûne sedema nîqaşan: krîza aborî ya cîhanî, kirîza kar û peydabûna keda hilberîner li seranserê cîhanê û li ser asta herêma Rojhilata Navîn, hebûna bihêz a jinan.

Jinên Kurdistanî di qada tekoşîna rizgarîxwaziya neteweya Kurd de, bi taybetî jinên Rojhilatê Kurdistanê di şoreşa Cinetê û tevgera jinan li beşên din ên Îranê li dijî hîcaba bi darê zorê û mafên wan ên mirovî û nerazîbûna li dijî tundiya zayendî ya li ser jinan û keçan bi awayekî sîstematîk û berdewam. Ev her 3 pêvajo bûne mijara sereke ya gelek çapemenî, torên civakî, semîner û konferansên di navbera çalakvanên Kurd û Îranî û cîhanî de. Niha em şahidê diyardeyekê di asta giştî de ne ku behsa bandor û peywendiya geşepêdana wekheviya zayendî di aramî, aşitî û pêşketina civakê û refaha civakî de dike.


Civaka baviksalarî ya westiyayî û şerxwaz êdî nikare cîhanê pêş bixe û pêşerojeke geş ji mirovahiyê re bîne. Ji ber vê sedemê, divê em xwe wek mêr li vê dinyaya ku baviksalarî bûye sedema şer, wêranî û windakirina hêviyan û bi milyonan mirov li cîhanê bi sed salane bûne qurbanî, azad bikin. Dinyaya îroyîn pêdivî bi pêşxistina dibistaneke nû heye. Dibistanek ku armanca wê pêşxistina refaha civakî, pêşxistina edaleta civakî û aborî û wekheviya di navbera hemû endamên civakê de ye.

Ji bo azadîxwaz û têkoşerên mafê çarenivîsa gelê Kurd, divê pirsek hebe: Çima di civakên ku wekheviya zayendî, dadperweriya civakî û aborî tê de ava bûye û hesta bextewariya wan bilind e, standarda jiyanê û refahê baştir e? Lêkolînên li welatên pêşkeftî, di nav de welatên Skandînavî û Japon, nîşan didin ku di civakên ku polîtîkayên aborî û civakî û biryarên siyasî li ser bingeha wekheviya zayendî ne, mirov bextewartir in, tenduristiya giştî baştir e, aramiya civakî zêdetir e, û baweriya wan a civakî di her astê de heye.
Li van welatan, xwesteka civakî ya hevpar heye ku rûbirûyê lêger û kêşeyên civakî bibe.
Wêca ev pirsgirêkane siyasî bin yan jî bi gefên jîngeh û ekosistemê ve girêdayî bin. Di lêkolînên têkildarî têkiliya di navbera wekheviya zayendî û tenduristî û başkirina civakî de, tê dîtin ku her ku asta wekheviya zayendî bilind be, asta tenduristiya civakî û takekesî ya endamên civakê jî bilindtir dibe. Ji bo gelên ku ji bo azadiyê têdikoşin, pêşxistina wekhevî û tenduristiya civakî tê wateya bihêzkirina hêzên şerker û zêdekirina hêza berxwedanê ya li dijî dîktatoriyê.

Di civaka Îran û Kurdistanê de, çi li hundir û çi li dîasporayê, gelek kes tendurustiya xwe ya takî û civakî bi cureyê dahatê û rewşa abûriya xwe ve girê didin.
Lê di eslê xwe de ev mijar bi asta hatinî û rewşa civakî re têkiliyeke nisbî heye. Civakên ku li ser bingeha têkiliyên sifir, nikarin pozîsyon û asta îstîxbarata xwe baştir bikin.

Mijara wekheviya zayendî ne tenê girêdayî wê ye ku jin bi wergirtina çend kursiyan di nav mêran de beşdarî biryarên siyasî bibin, lê ev mijar hewcehiyek e ji bo pêşxistina civakî di hemû astan de û pêşxistina kalîteya jiyana hemû endamên civakê, civak bi me mêran re. Di 50 salên borî de, welatên pêşkevtî bûne şahidê baştirkirina asta jiyanê û bextewariya civakî bi sedema hewlên ji bo baştirkirina asta wekheviya zayendî.

Îro em şahidê wê yekê ne ku heta bandora serayê û germbûna gerdûnî jî nekariye pêşveçûnên aborî û civakî yên van welatan rawestîne û ev welat ji berê zêdetir bi biryar in di riya beşdariya jinan di hemû astên rêveberiyê de. Sedema sêyemîn jî dîsa bi mi-



jarên aborî û bazirganî ve girêdayî ye: Civaka ku wekheviyê pêş dixe, dibe şahidê afirandina derfetên aborî. Hejmara keşf, dahênan û dabînkirina ku di civakên pêşkevtî û wekhev de hatine tomarkirin, ji yên civakên nepêşketî û newekhev gelek zêdetir e.

Ji aliyê berjewendiyên mêran ve jî, ji ber van 3 sedeman pêwîstiya me bi pêşxistina wekheviya zayendî heye:

1: newekhevî dibe sedema geşbûna madî û windakirina nirxên menewî û mirovî.

2: Civakên wekhev li hember gefên derve xwedî hestek hevpar in. Ev jî dibe sedem ku civak bi dilxwazî pirsgirêk û kêşeyên hevpar çareser bike.

3: Lêkolîn nîşan dide ku di civakên ku ji wekheviya zayendî re rêz tê girtin, serokên wan zêdetir girîngiyê didin ser jîngeh û aramiya civakî.Ji destpêka şoreşa "Jîna"yê ve heta niha me gelek gotar li ser pêwîstiya guhertina paradîgmaya civakî li Kurdistanê bihîstiye û xwendiye.
Me gotinên gelek xweş û balkêş ji serkirdeyên xwe yên siyasî li ser piştevaniya wan ji bo wekheviya zayenda civakî li Kurdistanê bihîstiye, ku hebûna hejmareke kêm ji jinan li ser asta serkirdayetiya rêxistinên xwe wek serbilindî difiroşine nîvê din ê civakê.

Lê rastiya meselê ev e ku bêyî pêşxistina wekheviya zayendî ya bi awayekî sîstematîk, plansazkirî û bi armanc, bi têgihiştina peyvê, em nikarin têkoşîna netewî li hemû astên civakê bi pêş bixin.

Pêşxistina wekheviyê tenê bi hejmara endamên jinê di desteyên rêveberiyê yên rêxistinan de pêk nayê, lê pêwîstî bi perwerdekirin û têkoşîna li dijî her cure tundiya zayendî û sûcdarkirina her cure tundûtîjiyê li ser bingeha zayendî di rêxistinên siyasî û civakî de heye. Me kêm caran diyalogek li ser têkiliya di navbera pêşveçûn û wekheviya zayendî de dîtiye. Naskirina vê pêwendiyê kevirê bingehîn ê guhertina paradîgmaya newekheviya civakî, vekirina deriyê tevlîbûna tev jinan di têkoşîna azadiyê de û lezkirina guhertinên civakî ye.

Jêder: Equality, Sustainability and the Quality of Life. BMJ2010;341:c5816

# Bi neheqî xwîna têkoşer dirijînin






**N: Elî Munezemî**

Hikûmeta terorîstî a komara Îslamî a Îranê jî her wek hemû hikûmetên totalîter xwediyê dehan rêkxistin û sazîyên ewlekarî û sîxurî ye li hundir û derveyî tixûbên Îranê. Armanc li avakirina wan hemû sazîyên pirreng ne bo parastina xelkê, lê bo sîxurî, çavdêrî kirin û şopandina xebat û peywendîyên çalakvan û dijberên rejîmê ye. Armanc li wî karî, bêbandorkirina wan çalakvan û kesên nerazî ye bi rêka gefxwarin, revandin, kontrolkirin, bêdengkirin yan jî kuştinê ye.

Her kesek ku carekê dijberîya rejîma terorîstî a Îranê kiribe, bi xasma aktîvîstên civaka sivîl, rojnamevan, serkirdeyên tevgerên muxalifetê, pêşmerge û şervanên azadîya neteweyên bindest, dikevin ber wan hêrişan.

Zaf dewletên Rojavayî bi eşkere bas ji rêkxistinên ewlekarî yên Îranê ku di şopandin û terora kesên dijberê Îranê dest hene, dikin ku didin zanîn ku Wezareta Itlaat û ewlekarîya Îranê ku dezgeheke hikûmetî ye û berpirsyarê wê wezîreke kabîneya serkomarîyê ye û ji aliyê rêberê rejîmê ve tê pejirandin, mezintirîn dezgeha şopandin û terora dijber û nerazîyên rejîma Îranê ye.

Meydana karê wê wezaretê hem li hundirê welat û hem jî derveyê welat ji xwe digre. Ew li hundirê welat jî xêncî bin çav girtina dijberan, li kuştin, girtin, îşkence û lêpirsîna wan de jî dest hene. Li derveyê Îranê ew berpirs in ji şopandina îraniyan û bêbandorkirina rêxistinên muxalîf ên Îranê. Ajanên îstîxbaratê yên ji Wezareta Îstixbaratê beşekî di bin sîvana dîplomatîk de kar dikin.

Xêncî wezareta Itlaatê, Itlaata Sipaha Pasdaran, Sipaha Quds û erteşa serhêl (Cyber) a Sipaha Pasdaran sê rêkxistinên din yê sîxurî-ewlekarî-leşkerî ne ku rolek bilind di sîstema ewlekarî a rejîma Îranê û bêbandorkirin û şopandina dijberanên rejîmê de hene. Itlaata Sipaha Pasdaran ku dezgeha sîxurî û ewlekarî a ser bi Sipaha Pasdaran e û rasterast li bin emrê rêberê rêjîmê de ye. Xêncî pişka çekdarî, ewlehî û pişikdariya Sipahê di proje û meydana aborî de, ewan herwisa dest li ser pişka telekomunikasyonê li Îranê de jî girtine û kartêkeriyek mezin li ser rewşa siyasî, civakî û hemû aliyên jiyana xelkê li Îranê de hene.

Sipaha Quds jî ku Şaxeyek ji Sipaha Pasdarên Şoreşa Îslamî ye, li operasyonên leşkerî yên nekonvansîyonel ên veşartî li derveyê welat berpirsyar e.

Ev hêz zaniyariyên istixbaratî kom dike, çalakiyên çekdarî li ser axa biyanî pêk tîne û bi rahênan, kelûmelên leşkerî û diravî alîkariya komên çekdar ên hevalbend ên li derveyî Îranê dike. Piraniya çalakiyên hêzên Sipaha Qudsê li nawçeyên nêzîk ên Îranê, ji wan Iraq, Sûriye, Lubnan û Yemenê pêk tên. Qurbaniyên çalakiyên Sipaha Quds, bêhtir xelkên welatên din in ku Îran wan welatan wek dijmin dihesibîne.

Îro rojê Dezgeha istixbarata Sipahê rolek mezin di sîstema Îranê de heye û rasterast di bin fermana rêberê rejîmê de dixebite.

Şaxeya serhêl a Sipaha Pasdaran di warê hêrişên înternetî û şopandina çalakiyên dijberên rejîmê li ser hêla înternetê dixebite û berpirsyare bo tirsandina dijberan, Sîxurî û dijayetîya her nivîs yan çalakiyekê ku bi dijî nirx û çanda rejîmê be. Hêrişên hakerî yêkek ji erkê wê şaxê ye.
Bo çavdêrîkirin û nexşekirina tora peywendî û çalakiyên dijberan, rejîm îmkanatên zaf xerc dike. Ew hem ji rêka ajan û bikaranîna teknîkên kevneşopî bo berhevkirina zanyariyan bi şêweya weşartî cehdê dikin ku kesên dijber bigrin bin çavdêriya xwe, hem jî ji rêka hakkirina hejmara hisab û rûpelên elektronîk yên serhêl ve zanyariyan kom bikin.

Rejîm her wisa li hêlek din ve jî cehdê dike ku dijberan bêbandor bike û bi rêka gef û binçavkirina endamên malbatên çalakvanan, cehdê dikin dijberan bêbandor yan bêdeng bikin û yan jî wan bêxin xizmeta armancên rejîmê. Ew bi wî rengî li hêlekê cehdê dikin ku desthilatdariya xwe li ser dijber û çalakvanan de bisepînin û li hêlek din jî, dixwazin wan bitirsînin ku ev nekarîn hêlên xwe yên peywendiya bi xelkê re rabigrin û di nava xelkê de xûya bin.

Eger sazîyên ewlehiya rejîmê di pîlanên xwe de bo bêdengkirin yan rakêşandina neraziyan bo aliyê rejîmê serkevtî nebin, revandin yan kuştina wan ji aliyê rejîmê ve tê pîlankirin.

Ewa ku rejîm kengê bixwaze kuştina dijberan bêxe bernameya sazîyên xwe yê ewlekarî, bi gorî demê û cih tê guhertin. Ew yek girêdayî bi pêşhatinên siyasî û guhertina şert û mercên navneteweyî ye. Bo mînak, terora pêşmerge û çalakvanên kurd li Başûrê Kurdistanê ku çi zirarek siyasî yan aborî bo rejîmê nebûye, her gava ku xwastine, li Başûrê Kurdistanê endam û alîgirên partiyên kurdî yên dijberê rejîma Îranê, anku kurdên Rojhilatê Kurdistanê, teror kirine.

Lê gava welatên Evropa piştî hukmê dadgeha Mîkonosê, givaşek mezin xistin ser rejîmê, ewan çalakiyên xwe yên terorê bo demekê li Evropa dane sekinandin. Lê niha ku rejîm bin dorpêçên aborî de ye û çi tiştek nemaye ji dest bidin, dîsa çalakiyên xwe yên terorîstî destpê kirine û wê carê bandên mafiyayî jî girtine bin xizmeta xwe bo cîbecîkirina wan cînayetan.

Her wisa hindek şirovekar jî didin zanîn ku her gav rejîm dikeve bin gef û hîs dike ku rejîm dikare bê herifandin, ew çalakiyên xwe yên terorîstî li derve û cînayetên xwe dijî xelkê li hundir zêdetir dikin.

Em dibînin ku wan çend salên dawî bi xasma wan çend heyvên derbasbûyî de, endam û pêşmergeyên PDKÎ li derve û li Başûr dikevin ber êrişên terorîstî yên Îranê û ew yeka jî dide eyankirin ku rejîm dîsa xwe li hember kurdan de lawaz dibîne û çalakiyên ew kesên rastî êrişan hatine, bandorek mezin li şerê hember rejîma terorîstî de hebûye.

Em dibe bi haydariyekî ji caran zêdetir û li barê ewlekarîtir tev bigerin û hevceye ku em hêla peywendî û bandordnîna ser xelkê jî zêdetir bikin ku rêjim di pîlanên xwe li hember me de rastî şikestê be.

# Kiryarên sipaha pastaran a terorîst li Sûriye û Îraqê





**N. Hûmen Simko**

Sipaha pastaran a terorîst roleke berçav li siyaseta derve ya Îranê de bi taybetî li Sûriyê û Iraqê de dilîze. Beşdarbûn û destverdana wan di van welatan de encamên kûr li ser aramiya herêmê û peywendiyên navneteweyî hene. Em dikarin li ser çalakiyên taybet ên sipaha pastaran a rejîmê, armanc û bandora çalakiyên wan li ser Rojhilata Nawîn zêdetir biaxivin.

Êrîşên rejîma Îranê bo ser partiyên Rojhilatê Kurdistanê
Êrîşên rejîma Îslamî ya Îranê bo ser partiyên Kurd ên opozisyonê, nîgeraniyeke siyasî ya kûr ji hebûna van partiyan li Kurdistana Iraqê heye, ew rejîma dîktator dixwaze bi awayekî bi êrîşan bo ser wan partiyên Rojhilatê Kurdistanê, îflas û şikesta xwe li hember bandor û pêgeha hertim û negora van partiyan perdepoş bike û senaryoyekê ji bo alîgirên xwe lîstokeke bi xwîn bilîze ku wiha bide xûya ku rejîm herdemekê ku hewce bike dikare bi êrîşkirin bo ser wan partiyan wan ji nav bibe, Em dikarin li ser jêrxanên dîrokî, sedemên van êrîşan û encamên wan him li ser Îranê û him ji bo dijberên wê yên Kurd gengeşe bikin.

Hewce ye ku em bi hûrî li ser êrişên rejîma Îslamiya Îranê li ser partiyên Kurd ên opozisyonê bisekinin. Ew pirsgirêkek digel kokên dîrokî û encamên berdewam aloz û tevlîhev bûye. Li vir lêkolînek berfirehtir hewce ye:

**Êrîşên rejîma Îslamî li ser partiyên kurdî yên opozisyonê**

**1. binyatên dîrokî**:
Kurdistan xwedî dîrokeke dûr û dirêj e ku daxwaza mafê netewiye xwe dike, ku bi salan, bû sedema avakirina partî û girûpên cuda yên Kurdî.
Peywendiyên Îranê digel gelê kurd ên Rojhilatê Kurdistanê, bi taybet li deverên Kirmaşan, Sine û Urmiyê, bi dehan sal in ku bi alozî û dijayetî û şer û pevçonan derbas dibe.

**2. Sedemên êrîşan:**
Rejîma Îranê gelek caran îdia dike ku partiyên kurdî yên opozisyonê metirsiyeke ewlehiyê li ser Îranê ne û ew bi îdiaya xwe ku yekem car wek "ziddê inqilab" binav dikir, piştî şoreşa "Jin Jiyan Azad"yê ku bo hemû aliyan bi taybet bo gelan li Îranê derkevt ku ne tenê kurd li dijî netewên din nîne û dixwaze bi awayekî demokratîk û li vekhevî û yekrêzî li civakeke demokratîk û federal de digel xelkê din ên Îranê bijî, ev peyva zidê înqilab bi bi cudaxwaz guhertiye.Partî û grûpên opozisyonê yên Kurdî ji aliyekî din ve, cudatîdanîna sîstematîk, serkuta çandî, netewî, olî û heta zayendî û nebûna ti bingeheke demokratîk li sîstema desthilatdar li Îranê û nebûna nûnertiya netewî-xelkî li pêvajoya birêveberî û darişṭina siyasetê de û desthilatdarî û dîktatoriya "wilayeta feqîh" wekî sedemên serekî yên encamdana çalakiyên xwe diyarî kirine.

**3. Herêmên cihê aloziyan:**
Sipaha pastaran a terorîst her demekê ku karîne, li êrîşkirin bo ser endam, pêşmerge, kadr û çalakvanên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê li başûr û bakûrê Kurdiustanê û heta li bajarên din li welatên din ên cîhanê xwe ji terorkirina fîzîkî û bi barimtegirtin û hemû hewlek bo jinavbirîn, ji rêderxistin, reşnavkirin û danîna pîlanên qirêj bo wan, xwe neparastiye.

**4. Paşhat**
Êriş û şer û pevçûnên hêzên sipaha pastaran digel hêzên tevgera Kurdî, bûne sedema xisarên canî û malî, awarebûn û ne aramî li deverê û bihêzbûn û geşeya terorîsmê li deverê de.

Ev kiryarên terorîstî yên sipaha pastaran dikare bandorê li ser peywendiyên welatên cîran ên wek Îraq û Tirkiyê jî bike.

**5. Bersiva navnetewî:**
Civaka navnetewî, car caran kiryarên rejîma Îranê yên li dijî partî û grûpên opozisyona Kurdî bi taybetî li derheq binpêkirinên mafên mirovan, şermezar kirine.
Tevî vê rewşê jî, bersivdana wan welatên cîhanê cuda cuda bûne ku bi piranî li jêr bandorên siyasî û dîplomatîk de bûne.

**6. Rewşa heyî:**
Fêmkirina rewşa heyî û pêvajoya vê bi derbasbûna demê dikare ku biguhere. Lêkolîna hûr a bûyerên vê dawiyê û rewşa niha gelek girîng e, ji aliyekê ve rûberûbûna partiyên kurdî bi rejîma Îranê re, ku siyasetên xwe li gorî dem, cih û rewşa siyasî ya Kurdistana Iraqê diguherin. Rejîma Îranê û dewleta Îraqê ji aliyê din ve û seha kurdînî ya geş li Herêma Kurdistanê li desthilat û li nav refên partiyên Başûrê Kurdistanê ku ketiye ber dubendiya êriş û givaşên ji aliyê Îraq û Îranê, rewşekê şêlû û aloz li ser hikûmeta Iraqê û hikûmeta herêma Kurdistanê û berxwedana partiyên Rojhilatê Kurdistanê çê kiriye.

**7. dûredîmena çareserkirinê:**
Çareserkirina aştiyane ya daxwazên gelê Kurd li Îranê jî karekî aloz û dijwar e û aliyên curbicur tê de beşdar in, lê heya ku desthilatdarî li Îranê, li jêr destê wilayeta feqîh û rejîma Îslamî ya Îranê be, ti delîveyek bo çareseriya pirsgirêkan bi awayekî aşîtîxwazane nayê dîtin û ev pirsgirêkê li Îranê Piştî Komara Îslamî jî heta ku sîstemeke demokratîk û dûr jî tundajo û faşîsma fars li Îranê desthilatdar û xwedî bandora bingehîn be, ti hiviyek bo çareserkirina aştiyane ya daxwaz û mafên rewa ya netewa Kurd û heta netewên din ên li Îranê jî namîne.

**8. Bandora li ser aramiya herêmê:**
Kiryarên rejîma Îranê li hember partiyên Kurdî yên opozisyonê, bi berçavgirtina peywendiya pirsgirêka Kurd li aliyên din ên sînoran ve îmkana wê heye ku bandorê li ser aramiya deverî, bi taybetî li Rojhilata Navîn de bike.

**9. Pirsgirêkên mirovperwerane:**
Êrîşên li ser partiyên kurdî yên opozisyonê nîgeraniyên mirovperwerane zêde kirine, ên wek koçberbûna xelkê medenî û binpêkirina mafên mirovan.

**10. Senaryoyên paşerojê:**
Bi berçavgirtina dûredîmena jeopolîtîk a li rewşa guherînê, girîng e ku senaryoyên paşerojê yên xwedî potansiyel û hewldanên dîplomatîk ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê bêne lêkolînkirin.

Di encama vê mijara berfereh de, têgihiştineke kûrtir ji êrişên rejîma Îslamî ya Îranê bo ser partiyên Kurd ên opozisyonê dide xûya. Ev pirsgirêkek tevlihev e ku bi pîvanên dîrokî, jeopolîtîkî û mirovî ve girêdayî ye û çareserkirina wê pêdivî bi lêkolînên gelek hûr û çendîn alî li ser gelek ji faktoran heye.

# Terorîsma rejîma Îranê tu carî bi dijî xebatkaran nesekiniye



Herwekî li daxûyaniya Navenda Teşkîlata Hizba Demokrat de hatibû, roja 25ê Xezelwerê endamekî Hizbê bi nave Sohrab Rehmetî ku hevdem karê dadweriyê jî li dezgeha dad a Herêma Kurdistanê de dike, li Hewlêra paytextê Herêma Kurdistanê kevte ber êrîşekî terorîstî û bi derba Gulleyan birîndar bû. Renge bo gelek kes û aliyan pirsyar be ku çima ev kiryara terorîstî bi armanca kuştina Sohrab Rehmetî hatiye encamdanê û dibe aliyê êrîşber û terrorist kê û çi aliyek be?

Bersiva pirsyarên han de divê bibêjin ku, Ev xebatkarê Demokrat ku bixwe Qaziyê Dadigehê ye, çendîn perwendên peywendîdar bi kar û kiryarên terorîstiye rejîma Îranê bi dijî têkoşerên Kurd û xebatkarên Hizba Demokrat, kêşabûne ustiyê xwe û li encama lêkolîn û pêregeheştina wan perwendan de, her hemiyan de hikmê dadigehê bi dijî rejîmê û mehkûmkirina terorîstên rejîmê lê kevt.

Ev yeka jî bo rejîma terorîst û terorîstên wê, gelek giran û tehl bû. Lewma rejîm kevte fikra pîlana terorkirina wî qaziyê Kurd û tol vekirina ji wî bi hegera wan hikm û mehkûmiyetên rejîmê û aşkera kirina kiryarên terorîstiye wê.

Ji aliyekî dinê jî Sohrab rehmetî endamekî têkoşere Hizba Demokrat û kesekî xûya û xwedî bandore û lewma rejîma Îranê herwek çavan li derbasbûyî de sedan xebatkarên rojhilatê kurdistanê li Başûrê Kurdistanê de teror kirine, cehd kir ku wî xebatkarî jî teror bike.

Bi keyfxweşî ve ev endamê Hizbê û Qaziyê xwedî bandor ji vê kiryara terorîstiye rejîma Îranê karî bi saxlemî xelas bibe û tenê bi derba gulle birîndar bibû û bê guman piştî nojdariya birîna xwe dê berdewam be li ser kar û xebata xwe a siyasî û herwisa li ser berdewamiya lêkolîn û aşkera kirina pîlanên terorîstiye rejîma Îranê bi dijî xebatkaran.

Teror û çêkirina xof û hovtiyê ji aliyê rejîma terorîstperwere Axundî, nikare xebatkarên Kurd ji xebat û berxwedanê sist bike û wan çavtirsandî bike.

# Daxûyanî li derheq terora endamekî Hizba Demokrat li Hewlêrê

**Bo raya giştî !**

Bo agehdariya heçî aliyekê em radigehînin serê êvariya roja Pêncşemiyê 16ê Çirriya Paşîn a 2023an Sohrab Rehmetî, endamekî xebatkare PDKÎ, herwisa Parêzer û endamê sendîkaya Parêzerên Kurdistanê û akinciyê bajarê Hewlêrê, li cihê jiyana xwe ber deriyê "Hana Sitî" kevte ber desrêja gulleyan û bi giranî birîndar bû.

Sohrab Rehmetî kadrê berê yê Hizba Demokrat ku parêzer çend perwendên wek terora û teqîna şeva Yeldayê li ber derê Deftera Siyasiya hizbê di sala 2026, Perwenda terora şehîd Qadir Qadirî li 2008, û perwenda mûşekbarana binke û barigehên Hizba Demokrat li 2018 an bû, bi caran û bi berdewamî kevtibû ber gefên navendên ewlehiye rejîma komara Îslamî û gefa kuştinê jê dihate kirin.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê tevî mehkûmkirina wê kiryara terorîstiye komara Îslamî, radigehîne ku destê rejîma komara îslamê li pişt êrîşa terorîstî bo ser Sohrab Rehmetî ye, me çavnihêrî ji navendên ewlehî û dezgeha dadiweriya Hikûmeta Herêma Kurdistanê heye ku vê bûyerê ji bona zelaliyê bişopîne, encamderên wê cinayetê peyda bike û digel aşkera kirina wê cinayetê, sûçdarên serekiye wê siza bide.

**Hizba Demokrat a Kurdistana îranê**

**Navenda teşkîlat**

**16ê Çirriya Paşîn a 2023 an**



## Nerîna Lîderan



**“Joe Biden”:**

“Cêo Baydên Serkomarê Amerîka: Rêkevtin ji boy azadiya hejmara pitir ji 200 giroganên ku li Xezê di destê Hemasê de ne, gelek nêzîke.”




**“Mohammed bin Salman”:**

“Bên Selman Welîehdê Siudî: Ez daxwazê ji hemî welatan daxwaz dikim ku Çekan bo Îsraîl re nehinêrin, û hewceye welatê Felistînê gorî sinûrên sala 1967an were pêkanîn.”.



**“Sabrina Singh” :**

“Ger rejîma Îranê li cehda berfireh kirina şerê Xezê de be, û bixwaze şer bikêşe herêm û welatên dine, dive Îran li hember de bersivderê wî bare girane ser mile xwe be, û ger şer bikêşe bo cihên dine û bi taybet bo Lubnanê, berpirsayetiya wê ustiyê rejîma Îranê ye. ”.



**“Ilham Aliyev”:**

**“**Îlham Elîyov Serkomarê Azerbayîcanê: Firanse bi çekdarkirina Ermenistanê, siyasetekî leşkerî girtiye bera xwe, hêzên şerxwaz li Ermenistanê de hay dide bo destpê kirina şerekî nû li herêmê de. ”.

# Tirkiye û Azerbaycan korîdora Laçînê jî ji Ermenistanê dixwazin!



**N. Eskender Ceiferî**




Êdî NATO zêdetir destê xwe davêje nav karûbarên Ermenistanê, û Tirkiye û Azerbaycan bi zimanekî tund dibêjin ku ew dixwazin korîdora Laçînê jî dagir bikin. Ev zêdetirî salekê ye ku Azerbaycanê bi piştevaniya Tirkiyê dest daniye ser beşeke zêde ji axa Ermenistanê. Ji destpêka 2023’an ve heya niha jî, ji bilî Artsaxê, ew dixwazin dest danîn ser hin navçeyên din jî.

Artsax, Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, ku wek Artsax jî dihat naskirin, dewletek bû ku di asta nevnetewî de bi fermî nedihat naskirin. Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di rastî de ewder wek dewleta DEFACTO ji Azerbaycanê veqetiya bû. Ew, heman dewlet bû ku Azerî û Tirkan têk bir.

Komara Nagorno Qerebaxê yan jî Artsax li başûrê rojavaya Azerbaycanê ye. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenistanê re hevsînor e.

Ji ragihandina serxwebûna di 1991’an vir ve, zimanê fermî yê Qerabaxê, Ermenî bû. Lê piştî ku Azerbaycanê dest danî ser vê navçeyê, Azerî kire zimanê fermî.

Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di rastî de ne kesek pişta Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi eşkere pişta Ermeniyan digire. Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo parastina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo parastina mafê Ermeniyan li wir tev nagere. Rast e li wir şerê Kurdan nayê kirin, lê belê şerê Ermeniyan û hemû wan pêkhateyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin.

Mijar kûr dibe û di rojên derbasbûyî de Tirkiyê bi awayekî eşkere ragihand ku ewê li hemberî Ermenistanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan ji destê Ermenistanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenitsan li pişta wê ye.

Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenitsanê ku sala 2011’an hatiye encamdan, li wî welatî bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurd dijîn ku ji 35 hezar kes ji wan re Êzidî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin. Helbet tê gotin ku Ermenistan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de pirtirbûna heşîmeta Ermeniyan li wê herêmê, nîşan dide ku ev herême, mafê Ermeniyan e. Ji xeynî hin gund û deverên biçûk ên Azeriyan, lê belê deverên din hemû yan jî piranî Ermenî ne.

Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin.

Di vê navberê de hin welat jî hene ku dixwazin rewşê aram bikin. Amerîkayê ragehand, ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguhestin û ew bûye sedema alozî, şer û kuştinên zêdetir.

DYA herwisa Tirkiye hişyar kir û ragehand, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenîstan û Azerbeycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dubare bike.

Beriya niha jî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragehandibû, heta niha hejmara çekdarên Sûrî li Azerbeycanê geheştiye 850 çekdaran û bendewarî hene hejmarekî zêdetir a çekdaran ji aliyê Tirkiyê ve bên şandin. Di şerê Azerbeycan û Ermenistanê de bi dehan çekdarên Şûrî yên ku Tirkiyê ew şandibûne şerê Ermenistanê, hatin kuştin. Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov ragihand, di çend rojên borî de, 36 çekdarên Sûrî yên ku Tirkiyê ew şandibûne eniya şer, hatine kuştin û bi dehan jî birîndar bûne. Wê saziya sivîl da zanîn, bi giştî heta niha 64 çekdarên Sûrî li Qerebaxê hatine kuştin.

Tirkiye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbeycanê dike, hejmarek ji çekdarên opozîsyona Sûriyê tevlî wî şerî kirin. Li gor zanayriyên Rewangehê, heta niha Tikriyê 1200 çekdarên Sûrî şandine şerê Qerebaxê.

Hevdem serokwezîrê Ermenistanê Nikol Pashinyan bang li civata navnetewî kir, da ku pişt rast bibin ku Tirkiye destê xwe nexe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê da li ser herêma Nagrono – Qarabaxê. Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenistanê ve di wî çaxî de hat ku şer di navbera Ermenistanê û Azerbycanê da derketî û Tirkiyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kiribû.

Balyozê Ermenistanê li Moskovayê Fardan Taganyan jî daye zanîn ku Tirkiye 4 hezar çekdarên Sûriyê bo şer li dijî Ermenistanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenistanê şandine. Herwiha Fardan Taganyan tekez jî kiriye Tirkiye wan komên tûndrew ê Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenistanê de bikarbîne.

Îranê helwesteke cuda hebû û tenê dixwaze berjewendiyên wê parastî bin.

# Karvedanên Şerê Xezeyê li ser Sûriyê



**N: Ebdulezîz Qasim**






Wekî em dibînin, ku Şerê Xezeyê bûye bûyereke cîhanî ya here mezin û raya giştî ya cîhanê bo aliyê xwe dikişîne, û roj bi roj zêdetir û dijwartir dibe, tevî hewldanên Amerîka yên rêgir li pêş berfirehkirin û belavbûna Agirê şer ber bi aqar û arasteyên din, lê wisa diyar dibe ku eger çareseriyek bilez ya aştiyane bo wî şerî neyê dîtin, dê berdewam be û helbet dê karvedanên wê yên mezin li ser nawçeyê hebe, bi taybetî li ser rewşa Sûriyê, hem wekî dewleteke hevsînor û dijberê Îsraîlê û herwisa ji ber hebûna bi dehan rêxistinên terorîst wekî Hizibulah li nav qada Sûriyê, ku ji aliyê Tirkiyê û Îranê ve hatiye dagîrkirin, herwiha ji ber qeyrana Sûriyayê ya mirovî û siyasî bi dirêjahiya 12 salan, ku îro bûye xeleka herî lawaz di hevkêşe û trazûyên navdewletî û herêmî de, û ji ber vê yekê dûr nîne ku qada Sûriyê ji aliyê Îran û Hizbullah ve li dijî Amerîka û Îsraîlê bihête bikaranîn. Gotineke kurdî ya pêşiyan heye dibêjê: (Ta ji cihê zirav re diqete).

Tevî daxuyaniyên berpirsên Amerîka û herwisa daxuyaniyên rayedar û karbidestên rêjîma Îranê, ku Îranê ti peywendî bi êrîşa 7ê Cotmehê ya Hemasê ve nîne, lê ev yek rast nîne, ku rêjîma Îranê nikare heta dawiyê peywendiyên xwe yên ligel Hemasê înkar bike, û êrîşên saxte yên Hizbullahê li ser xaka Îsraîlê û herwiha êrîşên niha dibin ji aliyê milîsên terorîst yên Îranê li Sûriya û Îraqê bi drone û mûşekan li dijî serbazgehên Amerîkayî li Sûriyê û li Herêma Kurdistanê, bi awayekî rastiya destverdana rêjîma Îranê ligel Hemasê û êrîşa 7ê Cotmehê aşkere dike, û daxuyaniyên Amerîkiyan û Îraniyan berovajî dike. Tevî ku heta niha rêjîma Îran bi awayekî rasterast tevlî şerê Xezeyê nebûye, lê bi awayekî tirsonek bi rêya milîsên xwe yên terorîst heta radeyekî dest heye di şerê Xezeyê de û di berjewendiya wê de ye nawçeyê ber bi şerekî (saxte û bi wekalet) bibe, her wekî li pêka heman siyaseta xwe ya leşkerî ya piştî Şerê Sedam û Xumeynî (1980-1988), ku rêjîma Îranê dê hewl bide Şer ji meydana xwe dûr bike û dê qadên din yên (yedek) li Îraqê, Yemen, Sûriyê û Lubnanî li dijî Îsraîlê û Amerîka bikar bîne. Herwisa dûr nîne ku rêjîma Îranê van qadên yedek ji bo bazarên xwe yên siyasî jî bikar bîne, nemaze ku heta niha şerê Xezeyê belav nebûye û bi tenê maye di sînorên Xezeyê de, ku bi kurt û kurmancî dikarin bêjin: ku şerê Xezeyê di navbera Hemas û Îsraîlê de şerekî giran û rasteqîn e, li hember ku şerê milîsên Îranê li dijî Îsraîlê li Sûriyê û Lubnanê şerekî saxte û derewîn e!

Tevî ku şerê bi wekalet di navbera rêjîma Îranê û hêzên Hevpeymaniya Navdewletî de li Sûriyê û bi taybetî li deverên Rojhilata Firatê (Dêrezorê) şerekî rasteqîn e, lê di heman demê ku her şerek di navbera rêjîma Îranê û Îsraîlê de, di nav qada Sûriyê de bibe, çi şerekî derewîn be yan jî rasteqîn be, dê karvedanên wê yên xirab li ser miletê Sûriyê hebe û dê qurbaniyek mezin bide, ku ticarî qada Sûriyê û miletê wê nikare barê şerekî wisa giran hilgire.

Wekî hemû dizanin, ku Sûriya di nav qeyraneke siyasî û mirovî û aboriya mezin de derbas dibe, ku ev nêzîkî 12 salan heye hîç çareseriyek bo qeyrana wê nehatiye dîtin, zêdebarî ku Sûriya bûye qada şer û bazrganiyê û ji hêla Tirkiyê û Îranê ve hatiye dagîrkirin, û heta vê gavê Miletê kurd li Rojavayê Kurdistanê baca here mezin ji qurbaniyan daye bê ku hîç danpêdanek navxweyî yan navdewletî bi maf û hebûna Miletê kurd li Sûriyê hebe.

Şerê Xezeyê heta niha bi dijwarî û bi giranî didome û dibe ber bi arasteyên din ve biçe, di demê ku heta niha hîç destpêşxeriyek Navdewletî yan Erebî bo agirbestê nehatiye pêşkêşkirin, lewra heta îro nehatiye zanîn ku ev (Şer) dê ber bi çi aqar û çi arasteyekê ve biçe, û helbet wê karvedanên wî şerî li ser astên navdewletî û herêmî hebin, bi taybetî li ser rewşa Sûriyê, û wekî gotina bav û bapîrên me ku dûr nîne (Ta yan werîs) di cihê zeyîf û xala lawaz re biqete, û goman di wê yekê de nîne ku îro Sûriya xala herî lawaz û zirav e, û xala herî lawaztir Rojavayê Kurdistanê ye, nemaze ku heta niha hîç rêkeftinek û yekrêziyek siyasî û ne siyasî di navbera hêzên kurdî yên Rojava de nîne, hevdem ku Tirkiyê bi awayekî berdewan û rojane Rojavayê Kurdistanê topbaran dike, û dê hewl bide ku mifahê bigire ji her delîve û derfetekî bo temamkirina projeya xwe a ji bo dagîrkirina tevaya Rojavayê Kurdistanê û jinavbirina doza Kurdî ya neteweyî li Sûriyê.

# Jinên azadîxwaz dîwarên tirsê şikandin





**N: Rojan Sofîzade**

Piştî evê ku rejîma dijî mirov a komara Îslamî di meha Xermanan a sala derbasbûyî de Keça Kurd a bi navê "Jîna Emînî" xelka bajarê Seqizê li Rojhilatê Kurdistanê li bajarê Tehranê de bi derba lêdanê kuştin, û piştre her li bajarê Seqizê ve û li dema xaksipariya termê Jîna yê gelê xwedî heste me ji boy xwedî derkevtin ji kerameta jina Kurd û li hember wê cinayeta rejîmê dengê nerizayetiya xwe bi dijî dîktatoriya deshilatdar li Îranê de bilind kirin û piştre wê nerizayetiyê û hevdengiyê pel havêtne hemî bajar û herêmê Rojhilatê Kurdistan û hemî Îranê, wê demê bû ku ev dîwarê tirs û xofa ku pitir ji 40 salî bû li ser Jinê çêkiribû bi yekcarî hate herifandin.

Jin û Keçên azadîxwaze Kurdistan û Îranê bi xwedî derkevtin ji maf û azadiyên xwe û bi şikandina qeyd û bendên sepandî bi ser xwe de ji aliyê rejîmê ve, bi pêşengiya xwe li xwenîşandan de û bi firedan û şewitandina laçka destê zorê ye serê xwe, tabo û dîwarê tirsa ser xwe herifandin, û di vê şoreşê de" Jin, Jiyan, Azadî, bû dirûşma jin û keçan û gelek nekêşa ku dengê mafxwaziya jinên Kurdistan û Îranê û dirûşma wan û pêşengiya Jinan li refa herî pêşê ye şoreşê de, li cîhanê dengveda.

Gelek welat û deshilatdarên herî pilebilin û saziyên navnetewî û kesayetiyan li piraniya welatên cîhanê de ji boyî piştgîrî dan bi Jin û Keşên pêşenge şoreşa Jîna yê, bertek nîşan dan û ji boy evê ku dengê xwe hem bo piştevanî ji şoreşê û hem şermezarkirina zilm û sitema rejîma Axundî bo ser jinan, dirûşma "Jin, Jiyan, Azadî" bilind kirin, wêneyên Jîna Emînî û keç û Jinên ku ji aliyê rejîmê ve hatne kuştin û birîndar kirin û girtin, bûne dîmenê rojane a hemî mediayê cîhanî û li nava paremanan û li saziyan de hatne hildanê, bi sedan û belkî hezaran kesan ji kesayetî û çalakên warên cuda cuda li seranserî cîhanê li ber kamêreyan bi Meqesê Pora xwe lêdan da ku xwe piştewanê jinên şoreşvanê Kurdistan û Îranê bidne nasîn, li gelek welatan navê şeqam û navendan danîn Jîna, li saziya netewên yekbûyî de, rejîma Îranê ji komîsyona meqamê jin hate derêxistin û gelek curên dinê ye piştgîriyê yên dinê.

Xûyaye ye ku starta lêdan û destpêkirina vê tevgera mezin a ku niha bi "Serhildana Jin, Jiyan, Azadî" û "Şoreşa Jinayê" hate naskirin, li pêxema xwedî derkevtin ji bê mafiya Jinan û sitema çend qatiye rejîma Îranê bo ser Jinan destpêkir.

Lewra Jin bûne pêşengê vê şoreşê û bo xwedî derkevtin ji mafê xwe û beşdariya li xwenîşandanê sala derbasbûyî de,Jinan nirx û bedelê giran dan, di vê şoreşê de dehan Jin û Keçên serhildêr li dema xwenîşandan de şehîd bûn, den Jin û Keçên din birîndan bûn, Sedan û belkî Hezaran Keç û Jin ji aliyê hêzên hov yên rejîmê ve hatne girtin û kevtne bin îşkenceyên dijvar û hikmê cazayê giran bi sera zaf ji wan de hate sepandin.

Rejîma dijî jine Wilayeta Feqîh, piştî heya qasekê kêmbûna bûna xwenîşandanan, dev ji tepeserî û dijminayetiya digel Jin û Keçên azadîxwaz berneda û berdewam kevte cehda tol hildan û tirsandina Jin û keçan, ku mînaka herî berçav eve ku rejîmê bi madeyên Kîmiyayî êrîş dikire ser Zanko û Qutabxanên Keçan û ev jehrawî dikirin û rewşekî tirs û xofê bi ser wan de zal bike, yan çendîn biryarên tundajo bi dijî Jinan ji aliyê navendên rejîmê ve hatne danê ku carekî din bi destê zorê hicaba zorê bînine ser rewşa berî şoreşa Jîna yê.

Rejîmê bi danana hêzên tepeserkar û ewlehî û libas şexsî, li cihên giştî wel Metro û park û Îstgah û nava bazarê, bi awayê hovane reftar di gel jin û Keçan dikirin, heta ku li Tehranê de keçekî Kurd a bi navê Armîta Girawend jî wek qedera Jîna Emînî bi derba lêdanê kuştin.

Niha bi wan hemî nirx û bedelên ku jinan ji boy şikandina dîwarê tirs û xofa ku rejîmê çêkiribû dane, û hemî biryar û yasayên paremayîyane yên rejîmê binpê kirine, gelek dijware ku carekî din rejîm bikare jina û keçan wegerîne ser rewşa êxsîrî û hicaba bi zorî a berî şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî".

Bê guman hindî rejîm givaş û tepeserî û dijayetiya xwe li ser Jinan û mafê wan zêde bike, hinde dinê jin û keçên mafxwaz û azadîxwaz dê rijd û mukumtir bin li ser daxazên xwe û bi ti awayekî amade nabin carekî din biçne bin biryar û yasayên kevnarperwerane yên rejîma dîktator, Jinên azadîxwaze Kurdistan û Îranê li benda derfeta yekcariye wê rejîma kevneperest dana û ev jî dixwazin bigehne mafê xwe û weke jinên pêşkevtiye cîhanê bikarin bigehne cih û maf û kesayetî û kerameta jêhatî bi xwe.

Bê guman dengê şoreşa bi dijî dîktatoriya komara îslamî û ji wan dengê Jin û Keçên mafxwaz ji heçî demê bilindtire û zûyan dirend dê kela dîktatoriya axundî tev biherifînin û bigehne Azadî û demokrasî û kerameta rastîne mirovî a xwe.

# Roja Çîroka Kurdî



2013
Yekitiya Niviskarên Kurdistana Sûriya

**Agehdariya Y.N.K li Ewropa**

Kurteçîrok yek ji hunerên vegêranê ye, ku serbor û serpêhatiyên mirov di çarçoveyeke hunerî de pêşkêş dike, çi bi awayekî riyalîzm (waq'igerî) yan jî bi awayekî aşopgerî û bi roleke mezin û serekî di dariştina hişmendiya civakî, rewşenbîrî û siyasî de lîstiye û hîn jî dilîze.

Dirustkirina hest bi xweşiya hunerî û geşepêdan û werarkirina xeyala kesê guhdêr, yek ji qazanc û mifahên here giring yên kurteçîrokê ne û dibe aliyê temamker yê zanînê, ku mirov zanînê li ser tiştên neyî (aşopî) ava dike, berevajî zanîna ku bi tenê li ser tiştên heyî ava dibe.

Gelê Kurd di çarçoveya çîrok û stranên folklorî de serederî ligel vê hunerê kiriye, ku bi dehên çîrok hene û di koçik û dîwanên gundên kurdan de hatine vegêran û guhdarîkirin, û dayîk û dapîrên kurdan di şevên zivistanê de çîrokên xeyalî li ser giyanewer û ajelan ji zarok û neviyên xwe re diafrandin.

Tevî geşesendina mezin ya Romanê di van bîst salên borî de, lê hîn jî çîrokê cihê xwe yê taybet heye, ku heta vê gavê jî bi dehan kurteçîrok li vir û li wir têne nivîsandin û weşandin, ji bilî çapkirina wan di rojname, malper û torên medya civakî de.
Bi sedemê lez û beza jiyanê û bargiraniya wê û givaşên mezin li ser mirov, ku êdî hest bi wê yekê dike ku dîtir demê wî têra xwendina çîrokên dirêj nake, tevî giringiya çîrokan ya here mezin, di demê ku Mirov dikare kurteçîrokekî di kêlîkeke kurt de bixwîne.

Helbestvanên kurd her ji mêj ve pîtedan û guhdarî bi hunera çîrokbêjiyê yê helbestî kirine, wekî çîroka helbestî (Şêxê Sin'anî) ya Feqiyê Teyaran (1590-1660), herwisa çîroka kurdî ya navûdeng (Mem û Zînê) ku ji aliyê helbestvanê kurd yê navdar Ehmedê Xanî (1651-1709) ve bi awayekî (destanî) hatiye nivîsandin.
Vê hunerê guhertineke mezin li ser destê zanayê kurd Mehmûd Bayazîdî (1797-1867) dîtiye, li ser destê wî çil çîrokên kurdî hatin komkirin û ji aliyê konsulê Rûsyayê yê li Împaratoriya Osmanî Aleksandr Jaba ve di pertûkekî de bi navê (danhevkarê çîrokan) bi fransî (NOTICES ET RÉCITS KOURDES) li Petersburgê di sala 1880 de hatibûn çapkirin.

Tevî nebûna lêkolînên rexneyî yên nûjen di wî warî de, lê hevdengiyek heye ku kurteçîroka kurdî bi forma hunerî ya nûjen li ser destên nivîskar Fûad Temo bi navê (çîrokek) di yekem hejmara Rojnameya (Roja Kurd) de, di Hezîrana 1913an de hatibû weşandin.

Ji ber vê yekê, Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê di 7ê Hezîranê 2014an de li bajarê Qamişlo yekemîn festîvala kurteçîroka kurdî li hola Subarto lidar xist û hefteyekê berdewam kir û bi wî awayî 6ê Hezîranê wekî roja çîroka kurdî hate ragihandin.
Bi armanca piştgirîkirina zimanê Kurdî û vê hunera sipehî û ciwan, (komîteya çalakiyan) ya Nûneratiya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê li Ewropa pêşbirka çîrokê ya sala 2024an radigihîne.

## Pêşbirka çîrokan

Nûneratiya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê li Ewropayê, bang li nivîskarên Kurd dike ji bo ku beşdarî vê pêşbirkê bibin, li gorî vê formula jêrîn:
Berhemên xwe wekî nameyekê li ser (Word)ê bo email'ê Nûneratiyê bişînin:
yekitinonrti@gmail.com
Kurteçîrok ji yekê Kanûna Pêşîn (01.12.2023) heta 1ê Reşemehê (01.02.2024) dê bêne wergirtin, û eger piştre bêne şandin jî nekevin di pêşbirkiyê de.

Di destpêka meha Reşemehê (Sibat) de, Komîteya Rêveber ya Pêşbirka Çîrokê, hemû çîrokên rikeber veguhêze ber destê komîteyek serbixwe ya nirxandin û biryardanê ku ji çend nivîskarên xwedî ezmûn di vê hunerê de pêk tê, ji bo helbijartina sê çîrokên here baş di warê "bîroke, ziman û hêmanên hunerî" de.

komîteya rêveber û Nûneratiya Yekîtiyê ti destwerdanê nake di mijarê helbijartin û nirxandina çîrokan de.

Pileyên pêzanîn û rêzgirtinê:
Helbijartina deh çîrokên herî baş li gorî pileyên wan û wergerandina wan bo zimanên din, di nav de bo zimanê Erebî, û weşandina wan li pey hev di kovara Yekîtiyê (Pênûsa Azad) de ya li Qamişlo tê çapkirin, paşî ku dê bêxin pertûkeke çapkirî.

Çîroknivîsên serkevtî dê bi xelatên diravî werin rêzgirtin.

yekem serkevtî: bi 300$, duyem serkevtî: bi 200$, û sêyem serkevtî: bi100$.

Navên çîroknivîsên serkevtî, dê di ahengekeke taybet de bêne ragihandin ku ji aliyê Nûneratiya Yekîtiyê ve di roja 8ê Hezîrana bê de, roja Şemiyê 08.06.2024 li Almanyayê were lidarxistin (cih wê piştre dê were destnîşankirin).

Sê çîroknivîsên serkevtî dê çîrokên xwe ji amadebûyan re bixwînin, bi amadebûna komîteya helsengandinê, ku wê bersiva pirsên amadebûyan li ser mijara hilbijartina kurteçîrokên serkevtî bidin.

Mercên beşdarbûnê:
Çîroknivîsên beşdar dikarin çnin.
Ku çîrokên xwe wekî fayilêkî îrokên xwe wekî fayil li ser Wordê bo Emilê taybet bi pêşbirkê
yekitinonrti@gmail.com bişîWord bişînin, ne wekî nameyekê.
Divê çîrok berê nih nehatibe weşandin, yan jî berê ti xelat wernegirtibe.

Divê çîrok bi zimanê kurdî bi tîpên latînî bê nivîsandin.

Her çîroknivîsek bi tenê dikare bi yek kurteçîrokê beşdarî pêşbirkê bibe, û eger zêdetir ji çîrokekî bo me hat, wê demê bi tenê yekem çîrok dê were wergirtin.

Divê çîrok zêdetir ji 1500 peyvan nebe û kêmtir ji 300 peyvan nebe.
Divê her çîroknivîsê beşdar zanyariyên xwe yên kesayetî, jimareya têlefona xwe yan Emilê xwe digel wêneyekî rengîn yê xwe bo emilê navbirî bişînin.
Almaniya 20.11.2023

**Nûneratiya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê li Ewropa**

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Di heyamê 2 mehan de 138 Kolberên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, hatine kuştin û birîndarkirin

Gorî amarên komkirî ji aliyê najansên mafê mirov ve, li heyamê 2 mehên derbasbûyî de, 138 kes kolber li Rojhilatê Kurdistanê ku 8 kes ji wan Zarok bûne û temenê wan ji 18 saliyê kêmtir bûye, li nawşên sinûriye Kurdistanê hatine kuştin û birîndarkirin.
Gorî wan amarên ku hatine tomarkirin, li destpêka meha Rezbera 1402 an a roji heya dawiya meha Xezelwerê, ser hev 138 kolber ku 8 kes ji wan Zarok bûne bi awayên wek teqa rasterast a hêzên rejîmê, girtin û kuştin û lêdanê ji aliyê çekdarên rejîmê ve, yan kevtina ser Mînan, hatine kuştin û birîndarkirin.
Ji koma wan 138 kolberan, 127 kes ji wan bi Gulleyên çekên hêzên çekdare rejîmê ve ku dikete %92 hatine kuştin û birîndarkirin.
Amara hatî tomarkirin dide xûya ku 85 kolber li nawşên sinûriye Hengejale li Banê, 33 kes li sinûrê Newsûdê, û yên dine jî li Seqiz, Merîwan, Pîranşehr, NodSe, û Tete a Hewramanê bûne.
Ev jî di demekê deye ku li 6 mehên Bihar û Hawîna îsal de, 13 kolber hatibûne kuştin û 77 kes jî birîndar bibûn û amara tomarkirî di wan 2 mehên Payîzê de dide xûya ku hejmara kuştî û birîndarên kolber gelek ji amara 6 mehên pêş xwe de zêdetire.



## Li heyamê 50 rojî de, 51 Sûxtberên belûç hatine kuştin

Gorî amarên belavbûyî, li heyamê 50 rojên derbasbûyî de, aliyê kêm 50 kes ji şewatberên Belûç li deverên cuda cudaye Sîstan û Belûçistanê cane xwe ji dest dane ku piraniya wan bi teqeya rasteraste hêzên mirovkuje rejîmê ve hatine kuştin.

Li heyamê wan 50 rojên despêka werzê Payîzê heta niha, 50 sûxtber bi gulleyên hêzên çekdare rejîmê û bûyerên vergeryana maşînan, yan şewitîna di nava Agir de cane xwe ji dest dane.
Herwisa ji bilî kuştina 50 Belûçên Şevatber, dehan kesên dinê jî bi teqeya hêzên rejîmê birîndar bûne.
Deverên Belûçistanê ku kevtine ser sinûrê Pakistan û Efxanistanê, piraniya xelkê wê bêkar û belengazin û zêdebarî dehan metirsiyên ser rêka xwe, ji bona peydakirina nanekê, hewara xwe bo veguhestina şevatê wek Neft, Gazoîl, û Benzînê birine.

Gorî amaran kêm roj heye ku li Kurdistanê kolber û li Belûçistanê Sûxtber nekevne ber teqa hêzên rejîmê û yan têne kuştin, yan birîndarkirin.



## Rejîma mirovkuj pêla sêdaredana girtiyan zêdetir kiriye

Rejîma komara îslamî kêm roj heye ku çendîn kesan bi sûçên cuda cuda, li girtîxanên xwe de, li sêdarê need.

Roja derbasbûyî 21ê Xezelwerê 3 lavên Belûç li girtîgeha Zahidanê de, hatne sêdaredanê, ku rêkxistina mafê mirove Îranê ragihand ku 3 kes bi navên, Mihemed Kerîm Barkezayî temen 28 salî, Mihemed Birahûyî temen 28 salî, Idrîs Bîleranî temen 31 salî, li girtîxana Zahidanê de ji aliyê rejîmê ve hatine êdamkirin.

Herwisa roja 20ê Xezelwerê jî girtiyekî dine ye siyasî bi nave Meysem Dêhqanî li girtîgeha Dozapê de hatiye sêdaredanê.

Rêkxistina mafê mirove Îranê ragihan: Tenê di roja Yêkşemiyê 21 Xezelwerê de, Li girtîxanên Adilabada Şîrazê, Îsfehan, Cîroftê de, serhev 9 girtî bi sûçên cuda cuda ji aliyê rejîmê ve hatine sêdaredanê.



# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdiśtanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (458)